# Rengê Xwedanî Li Ser Desthelatê

Ev rastîyekîye ku ev hêza Xwedanî îcadekî beşerîye û cara pêşîn li vê axê derketîye. Li ti deverekî cîhanê wkî ku li rojhelata navî çêbûye hêza Xwedayî û raman û bawerîya Xwedayî û ramana desthelatdarîyê derbasî bava hevudu nebûye û di nava hevudude nehatîye rêsandin û hinandin.

dom»R:10




# Şehîd Simayîl Şerîfzade, sîmaya 18 heyv berxwedana li Rojhilatê Kurdistanê

Rojhilatê Kurdistanê çi li serdema rêjîma Pehlewî û çi li serdema rêjîma Komara Îslamî de, hertim navenda berxwedan, xebat û tekoşîn û serîhildana şoreşvanan bo dabînkirina mafê netewî-siyasiyên gelê Kurd û dêmokrasî û azadiya gelên îranê bûye, ti demekê xortên netewiyê Kurd, îzna vê yekê nedane dujminên maf û azadiya gelê Kurd ku bigehne xweziya xwe û gelê me tune bikin.

dom» R:4


*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (469) 05-05-2024 Buha (1000) Tûmen*


# Alman zêdetirî berê girîngiyê dide çand û zimanê Kurdî!

Di heyamên derbasbûyî de bi awayekî fermî du saziyên ser bi dewleta Almanya, dest bi karên xwe bi zimanê Kurdî kirin.
Tora ragihandina pirrengî li Almanya karî ji bo du salên din jî bûdceyê ji xwe re bistîne.
Herwisa biryar hate standin ku êdî xelk bikare bawernameya ajotinê bi zimanê Kurdî derxîne.

dom» R:7



## Mistefa Hicrî: "Sepandina cezayê bidarvekirinê bi ser Tûmac Salihî, berdewamiya siyaseta rêjîmê bo tepesrerkirin û jinavbirin dijberan e"

Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurtdistana Îranê, li derheq sepandina cezayê bidarvekirinê bi ser "Tûmac Salihî", peyamek belav kir.

**Deqa peyamê wiha ye:**

Sepamdina cezaya bidarvekirin bi ser #Tûmac Salihî, yê stranbêj û repêr bi sedema helwîst û nerizayetiyên wî bi dijî siyasetên rêjîma Komara îslamî, bi tohmeta "Mufsidê Fîl Erz", berdewamiya siyaseta rêjîmê bo tepeserkirin û jinavbirina dijberên xwe ye.
"Tûmac Salihî" ku stranên wî zêdetir aliyên siyasî hene û naveroka wan nerizayetî li dijî rêjîmê ye, bi dirustî enya xebat dijî sitemkariyê hilbijart.
Tevî şermezarkirina vê cezaya nemirovane, em daxwazkarê piştevaniya navendên Mafê Mirovî, bo hilveşandina cezaya bidarvekirina wî girtiyê siyasî dikin.

**Mistefa Hicrî**
**Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurtdistana Îranê**
**7ê Banemra 1403 a Rojî**






## Peyama rêzdar Mistefa Hicrî bi hilkevta roja cîhanî a Kirêkar

**Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta roja cîhaniya Kedkar, peyamek belav kir.**

**Deqa peyamê wiha ye:**

**Li Îrana qeyranawiya li jêr desthilata Komara Îslamî de, li demekê de yada roja cîhaniya kirêkar tête bi bîranîn ku em dibînin rewşa jiyana kirêkaran û rewşa bijîva vê qata civakê heta dem derbas dibe xirabtir dibe.**

dom» R:3

## Peyama Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 12ê Banemer, Roja xwendekarê Kurd

**Xelkê Azadîxwazê Kurdistanê!**

**Endamên Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat ên Kurdistanê**

**Xwendekarên bi seh û xebatkarê Kurd!**

**Bi hilkefta 12ê Banemerê, roja Xwendekarê Kurd, em bi germî pîrozbahiyê li we dikin û rêz ji xebat û tekoşîna siyasî û Banora we li çepera xebata rewşenbîriya nasnamexwaziyê de digrin.**
**12ê Banemra îsal, 56 sal li ser bûyerekê re derbas bû ku wek rûpeleke rohnîder li dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de hatiye tomarkirin û bûye seha xebatkaran û welatparêzan bi taybet xwendekarên derwest ên Kurd.**

dom» R:2

# Peyama Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 12ê Banemer, Roja xwendekarê Kurd

**Xelkê Azadîxwazê Kurdistanê!**

**Endamên Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat ên Kurdistanê**

**Xwendekarên bi seh û xebatkarê Kurd!**

Bi hilkefta 12ê Banemerê, roja Xwendekarê Kurd, em bi germî pîrozbahiyê li we dikin û rêz ji xebat û tekoşîna siyasî û Banora we li çepera xebata rewşenbîriya nasnamexwaziyê de digrin.

12ê Banemra îsal, 56 sal li ser bûyerekê re derbas bû ku wek rûpeleke rohnîder li dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de hatiye tomarkirin û bûye seha xebatkaran û welatparêzan bi taybet xwendekarên derwest ên Kurd.

Li sala 1346 a Rojî de, hejmarek ji xebatkarên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li jêr navê Komîteya şoreşger a Hizba Dêmokrat û bi armanca şikandina zilmata şevezenga rêjîma paşatiya Pehlewî çexmaqê serhildaneke çekdarî lêdan û binav cezîra aramiya mihemedriza şahê Pehlewî hejandin. Li vê serhildana dîrokî de Îsmaîl Şerîfzade wek yek ji rêberên serhildanê wek xwendekareke têgihîştî û pêgihîştiyê Kurd, roleke bi bandor û karlêker li ser hişariya netewî û xebata nasnamexwaziya Kurd hebû. Îsmaîl Şerîfzade pêşengê vê têkoşerên siyasiyên Kurd bû ku helwîsta siyasî û irada xebatkariya wan, pênaseyeke nû û nasnameyeke netewî da bi xwendekar û têkoşerên siyasî û sinfa xswendekaran li zanîngehên Îranê.

Li demekê de ku rewşa siyasiya Îranê li dehika 40an a Rojî de bi tevavî kevtibû jêr bandora hizra çep ji aliyekê û hizra netewgeriya Îranî jî aliyeke din, hejmarek ji xwendekarên Kurd li zanîngehên bajarê Tehranê ku yek ji wan Îsmaîl Şerîfzade bû, pêywendiyeke gotarî û siyasî digel tevgera “Millî Dêmokratîka Kurdistanê” girêdan ku bû destpêka serhildana aliyeke rijd û netewî li hundirê tevgera Kurdistanê ku Hizba Dêpmokrat a Kurdistanê, rêberatiya vê dikir. Hevdem pêywendiyeke me`irifî û hevdem du alî li navbera çepên tundajo û netewxaziya Kurdî de hate pêş ku tevgera çekdarî ya salên 46-47, berhema vê guherînê bû.

Ew qonax ji dîroka Îranê de ku azadiyên siyasî bi tundî dihatine tepeserkirin û ti hiviyek bo rêforma siyasî li Îranê de nedihate kirin, Şerîfzade û refek din ji ciwanên xwendewar û yên zankodîtî ên vê serdemê, çepera xebat û tekoşîna xwe ji zanko û navxweyê welat bo çiyayên Kurdistanê û bo nav refên têkoşerên Hizba Dêmokrat a Kurdistanê, veguhastin. Wan tevî cehd kirin bo bilindtirkirina asta hişariya siyasî û hizra netewî û bilindkirina taybetmendiyên serbixweyiya siyasî li Hizba Dêmokrat û giringîdan bi tekoşînê li navxwyê Rojhilatê Kurdistanê, bûne hêwinê rêkxistina serhildaneke çekdarî bi dijî desthilata ‘Mihemedriza şahê Pehlewî.

Tevgera çekdarane ya Kurdistanê li salên (1346-47), yekem tevgera çekdarî bû ku li Îranê de digel pêşwaziya gerim a xelkê bêzarbûyî rûberû bû û bû destpêkek bo destpêkirina xebata partîzanî li deverên din ên Îranê de jî. Li encamê de roja 12ê Banemera 1347 a Rojî, kak “Simayîl Şerîfzade û çend hevçeperên wî li devera Banê de kevtine nav kemîneke hêzên tepeserkar ên rêjîma paşayetî û hatine şehîdkirin.

**Xwendekarên welatparêzên Kurd!**

Xwendekarên Kurd ên rojhilatê Kurdistanê li serdem û qonaxa niha de jî, beşeke çalak ji tevgera netewî û rizgarîxwaziya netewa xwe ne. Wan li navxweyê Îranê de tevî tundûtîjiyên dezgehên tepeserkar ên rêjîmê, li nav zanîngehan û li ser çepera şeqaman de jî li enya xebat û berxwedanê de bûn. Ew jî li rewşekê de ku komara îslamiya Îranê her ji destpêka hatineserkara xwe ve zanîşgeh bi gef li ser binyata îdeolojiyên xwe dizanî û organ û damezraveyên curbiur ên ewlehî li zanîngehan de cihgîr kirine û cehdê dike ku dengê azadîxwazî û mafxwaziya xwendekaran bifestisîne, Lê tevî vê yekê, me dît ku li pêvajoya şoreşa “Jîna”yê de xwendekaran li piraniya zanîngehên Kurdistanê, bûne pêşeng û avangardê vê şoreşê. Keç û kurên xwedekar ên Kurd li zanîngehên Îranê û Rojhilatê Kurdistanê de xwest û daxwaziyên civakî, aborî û siyasiyên xwe li konteksta xebateke nasnamexwaziya netewî de kirne hêwinê çalakiyan û hemû binyatên siyasî û îdeolojîk ên rêljîmê kirine armanc.




Şoreşa “Jîna”yê û serhildana berfireh a xwendekaran li pêvajoya vê şoreşê de ji gelek aliyan ve berdewamiya xebata şehîd “Şerîfzade” û hevalên wî, li vê serdemê de bû û gelek xalên hevpar li wan du qonaxan de tênê dîtin. Seha şoreşvanî û binyatşikêniya Şerîfzade û hevalên wî li lêrasan û rabûn li dijî sitemkarî û dîktatoriyê, derwestiya netewî, niştimanî û tevlîbûn bi tevgera netewî û herwisa geşekirina hivîya xwendekaran bo guherînên binyatî, ew vekheviyane ne ku çalakiyên xwedndekaran li şoreşa “Jîna”yê bi xebata xwendekarî ya dehika 40 a rojî ya bi pêşengiya Şerîfzade ve girê dide. Vê yêkê jî wisa kiriye ku doza Şerîfzade wek rêber û hêma û pêşengê xwendekarê Kurd bi berdewam berhem hebe û ji hişmendiya binavkirina roja şehîdbûna “Şerîfzade” wek roja Xwendekarê Kurd ji aliyê yekîtiya xwendekarên Dêmokrat ên Kurdistana Îranê ve pêşewaziya civaka xwendekariya Kurd ji vê binavkirinê bilindtir bibe.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî vê yekê ku tevgera xwendekariya Kurdî bi tevgereke guherînxwaz, netewî û dadperwer dizane, baweriyeke kûr bi rêkxistina herî zêdetir a xwendekaran heye bo komkirina şiyana wan li sekinîn li hember dîktatorî û hemû curên sitema netewî, regezî û qatî heye û li vê pêxemê de xwendekaran han dike ku şiyan û hêza xwe li pêxema armancên bilind ên vê tevgerê bi kar bînin.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê nlin jêr sîbera giringiya xebeta xwendekaran û girêdana vê xebatê bi tevgera netewiya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, Yekîtiya xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê avakiriye û bi vê rêyê, piştevanî li xebata xwendikarên Kurd bo gihîştin bi armancên bilindên wan dike.

Navenda Birêveberiya Hizba Dêpmokrat a Kurdistana Îranê tevê bilind ragirtina yad û bîranîna Şehîd “Simayîl Şerîfzader”, sembola tevgera xwendekariya Kurd, pîrozbahiya 12ê Banemerê, roja Xwendekarê Kurd li birêveberên Yekîtiya Xwendekarên Kurd ên Dêmokrata Kurdistanê, civaka xwendekar û hemû xelkê Rojhilatê Kurdistanê dike û piştevaniya xwe li xebata micid û rû bi geşekirina xwendekarên bivêr û pêşengê civaka Kurdî dubare dike û zanîngeh û navendên akademîk çi li berhemanîna hizir û çi li warê çalakiyên meydanî de bi bizvêner û pêşengê xebata giştî dizane.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Birêveberiya Giştî**

**12ê Banemera 1403 a Rojî**

# Peyama rêzdar Mistefa Hicrî bi hilkevta roja cîhanî a Kirêkar

**Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta roja cîhaniya Kedkar, peyamek belav kir.**

**Deqa peyamê wiha ye:**

Li Îrana qeyranawiya li jêr desthilata Komara Îslamî de, li demekê de yada roja cîhaniya kirêkar tête bi bîranîn ku em dibînin rewşa jiyana kirêkaran û rewşa bijîva vê qata civakê heta dem derbas dibe xirabtir dibe.

Li encama siyaseta çewt a rêjîmê, rewşa jiyana xelkê bi awayeke giştî û bi taybet qedera milyonan kedkar û malbatan tevlî nebûna maf, bêkarî, tewerom û hejmarek pirsgirêk û astengiyên binyatî yên din bûne, bi awayekê ku ji jiyaneke bi rûmet a mirovî û jiyaneke serdemiyane û pêşkevtî bêpar in.

Tevî pîrozkirina vê hilkeftê li kedekarên Kurdistan û Îranê, em hivîdarin ku tevahiya qatên civakê bi yekîtiya xwe, xebata li dijî rêjîma zilimkar a Komara Îslamî rijdtir bikin û bigehne bi daxwazî û mafên zevtkiriye xwe.



**Mistefa Hicrî**

**Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**1ê Maya 2024 a Zayînî**

# Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li derheq hukmê bidarvekirina Tûmac Salihî, daxuyaniyek belav kir

Li çend heftiyên derbasbûyî de ‘ piştî tuntirbûna givaşan ji aliyê hêzên Komara Îslamiya Îranê ve bo ser tevgera "Jinan" û azardan û bêrîzîkirina bi wan li ser şeqaman, belavbûna nûçeya sepandina cezaya bidarvekirinê bi ser "Tûmac Salihî", hunermendê xoşvanê xelkê û xwedîhelwîst, pêlek ji kerb û nerizayetî li Îranê û li asta navnetewî de bi rê xistiye.

Sepandina wî cezayê nerewa bi ser Tûmac Salihî li halekê de ye ku pêştir li dadgeha bilind anku "Dîwanê Aliya Kişwer" de cezaya sepandî ya pêştir a dadge şoreş a Îsfehanê hatibû hilveşandin û Tûmac piştî salek û 21 rojan bi danîna barimteyê û bi awayê demkî ji girtîgehê hatibû azadkirin, lê ji nû ve dosyeya wî bi taya 1 a dadgeha Îsfehanê hate şandin û li wir de vê carê cezayê bidarvekirinê bi ser Tûmac Salihî de hate sepandin.

Bê şik, ew cezayê nerew berî hemû tiştekê nîşaneya bêzarî û kerbên zêde yê Komara Îslamî ji xelkê hişar û serîhildayî yên Îranê ye û dixwazin bi destavêtin bi tepeseriya tundûtîj û bi xwîn, bo heyameke din temenê rêjîmê dirêjtir bikin.

Tûmac Salihî, yek ji hunermendên bivêr û dengên netirs ên tevgera "Jîna"yê ye ku her ji destpêkê ve li nava xelkê de, dengê nerizayetiya xwe bi dijî desthilatdarên Komara Îslamî bilind kiriye û bi taybet piştevanîkirina xwe li xelkê Kurdistanê daye xuya, lewma wiha kevtiye ber kerb û kîna rêjîma Koimara Îslamî û dixwazin bi wî awayî tolê jê hildin û cezaya giran bi ser de bisepînin.



Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, tevî şermezarkirina sepandin cezaya nerewa ya bidarvekirinê ji aliyê dezgeha dad a Komara îslamiya Îranê ve bi ser Tûman Salihî, daxwazê ji civaka navnetewî, navendên xwedî bandor ên cîhanê, partî û aliyên siyasî yên Kurdistan û Îranê dike ku hemû cehda xwe bikin bo hilveşandina vê cezaya nerewa û rizgarkirina canê "Tûmac Salihî".

**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**7ê Banemera 1403**

# Şehîd Simayîl Şerîfzade, sîmaya 18 heyv berxwedana li Rojhilatê Kurdistanê



**N. Nasir Salihî Esil**
**W. Bêhzad Simko**



Rojhilatê Kurdistanê çi li serdema rêjîma Pehlewî û çi li serdema rêjîma Komara Îslamî de, hertim navenda berxwedan, xebat û tekoşîn û serîhildana şoreşvanan bo dabînkirina mafê netewî-siyasiyên gelê Kurd û dêmokrasî û azadiya gelên îranê bûye, ti demekê xortên netewiyê Kurd, îzna vê yekê nedane dujminên maf û azadiya gelê Kurd ku bigehne xweziya xwe û gelê me tune bikin. Lewma bi mifahvergirtin li hemû şêwazên xebata rewa, piştevanî li mafê neteweya sitemlêkiriyê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de kirine. Rohn e ku baskirin û mêzekirin li dîroka tevgera rizgarîxwaziya salên 1346-47 li Rojhilatê Kurdistanê bi balkêşandin bi girîngî û nirxa vê, hewcehî bi hûriyeke zêdetir heye, çimkî hem bûyereke girîng û hem xaleke guherînê û şêweya xebateke nû li dîroka siyasiya xebata rewa ya netewa Kurd li rojhilatê Kurdistanê bûye.

Piştî hilveşîna Komara Kurdistanê, Xebata gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi şêwazên cur bi cur ên nihênî û ji dûrxistinê ve berdewam bûye, heta salên "1346-47"ê de ew xebata nihênî bi şêwaza xebata çekdarî xwe da nîşandan û hêz û iradeyeke nû da xebatkaran û azadîûxwazên gelê Kurd. Lewma li vê qonaxa tevgera rizgarîxwaziya Kurd de bi rêberîiya Hizba Dêmokrat a Kurdistanê, xala guherîn û destpêkirina xebata çekdarî û karê rêkxistinî li dijî desthilta serberedayî û dîktarora "Mihemedriza şahê Pehlewî" bûye, lewma jî serhildan û berxwedana xortên cangorî yên netewa Kurd li wan salan de helwîsteke şoreşvanî û rûpeleke zêrîn li xebata rewa ya çekdarî bo mafên siyasî û netewî û dirokiyên pir ji şanazî li xebat û tekoşîn bi Hizba Dêmokrat a Kurdistanê tê dîtin.

Yek ji rêberên tevgera pir ji şanzaî ya serîhildana çekdarî ya salên "1346-47" a Rojhilatê Kurdistanê, Şehîd Muhendis "Simayîl Şerîfzade bû. Şehîd "Simayîl Şerîfzade" ew xwendekarê xwedî şiyan û azadîxwaz û şoreşvanê gelê Kurd bû ku li serdema desthilta dîktatoriya "Mihemedriza şah" de bi hûrî û bi hilsengandina rewşa vê serdema Îran û Kurdistanê û bi tevlîbûn bi refên Hizba Dêmokrat a Kurdistanê, şiroveyeke taybet bi vê qonaxê dest pêkir û rasana xebateke çekdariya nû hebû. Dariştina bername û pilanên şerê partîzanî wek diyardeya xebata hêza çep û şoreşvan li dijî rêjîmên dîktatorî li asta navnetewî de û serkevtinên wê qonaxa xebatên çekdarî yên gelên azadîxwaz û şoreşvan li Amerîkaya Latîn û asiya û Afrîqayê de hêwinê hizra şoreşvaniya Şehîd "Smayîl Şerîfzade"yê her tim zindî û hevalên wî bû ku li zanîngeha Têhranê de çîlo dabû. Lê tevî wan cudatî û berevajîtiyên hizir û teoriyên çep ên vê serdema Îranê ku civaka Îranê bi pasîv dizanîn, ji dîtingeh û awirê Şehîd "Simayîl Şerîfzade" û hevalên wî li Hizba Dêmokrat de, civaka Kurdîstanê pasîv nebû, belkû civakeke xwedî hêz û şoşerşvan bû ku mîrat û potansiyela mayî ya tevgera rewşenbîriya Kurdî û binyata hizrî û armancên Komara Kurdîstanê bû. Lewma pêywendiya tevgera xebata çekdarî û rêkxistinî ya salên "1346-47" a rojî, digel civaka Rojhilatê Kurdistanê pêywendiyrkî dualî bû.

Ji aliyekê tevgera rêkxistinî û çekdariya şoreşvanan, hêz dida civaka Kurdistanê û ji aliyê din ve, hêza xwe ji cîvaka Rojhilatê Kurdistanê verdigirt. Çimkî li serdema rêjîma "Mihemedriza şahê Pehlewî" de ji aliyek hemû mafên netewî û siyasiyên gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê hatibû binpêkirin û ji aliyê din ve kiryarên vê rêjîmê bo milîtarîzekirina zêdetir a Kurdistanê piştî hilveşîna Komara Kurdistanê û bi girtinabere siyaseta lipeyketin û girtin û binçavkirina xortên mafxwazên gelên Kurd, rêjîma Pehlewî ti rêyek siyasî û yasayî bo tekoşîn û çalakiyên gelê Kurd nehiştibû. Lewma Şehîd "Simayîl Şerîfzade" û hevhizrên wî hatine ser vê bawerê ku bi tenê rêya sekinîn li hember desthilata dîktator û hirbûyî ya "Mihemedriza şah", xebata çekdarî û rêkxistinî ye. Şehîd "Simayîl Şerîfzade" li nivîsekê de ku bo Şehîd "Dr. Qasimlo" şandibû nivîsandiye: "Îro bahozeke bihêz a şoreşvanî, seranserê welatê me li xwe girtiye û civaka xelkê Kurdistanê hatine ser vê baweriyê ku kite rêya rizgariyê, dest bi çek birin û kevtin bi çiyayan e, ne bi tenê bo me, belku rêya rizgariya her netewek bindest e". lê mixabin li roja 12ê Banemera 1347 a Rojî de Şehîd "Simayîl Şerîfzade" digel çend pêşmergên din li gundê "Darîne"yê ser bi bajarê Banê, li halekê de ku mijûlê geriyaneke siyasî-nizamî bûn, ji aliyê xwefiroşekî ve cihê mana wan aşkere bû û hêzê dibine ser wan ku piştî şerekî qehremanane digel 3 hevçeperên xwe bi sedema caş û candirmeyên rêjîma "Mihemedriza şah" ve hatine şehîdkirin.



Lewma niha bo nivşa serdemê şoreşa "Jîna"yê karlêkerî û bandora kesayetiyên wek Şehîd Muhendis "Simayîl Şerîfzade", bûne rastî û hêmayek bo xebata netewî û stêra ronî û sîmaya pêşengê 18 heyv xebat û berxwedanê ku netewa Kurd û tevgera xwendekariya Kurd û nivşa şoreşa "Jîna"yê şanazî bi vê rê û dozê dikin.

Lewma Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat ên Kurdistana Îranê li sala 1386 a rojî de bi sehkirina berpirsayetî û bi mêzekirin bi tevgera pêkahateşikên a xwendekarê Kurd, Şehîd "Simayîl Şerîfzade", wek hîmaya Xwendekarê Kurd û roja 12ê Banemerê wek roja Xwendekarê Kurd, binavkir. Li salvegera şehîdbûna "Simayîl Şerîfzade û hevalên wî" de soza xwe nû dikin ku heta serkevtinê doz û rêbaza Şehîdan berdewam bikin.

# Rejîma destdirêjîkeran



**N. Elî Munezemî**



Li berê de heta nia şîdeta sêksî an destdirêjîkirn yêkek li trajedîyên dîroka merivahiyê e ku serdema nakokî û pevçônan de zêdetir li dijî merivan tê bikar anîn. Ew yeka bi armanca tirsandin û têkşikandina îradeya kesên dijber û dagîrkirin û destserdegirtina civakan tê bikar anîn. Rêkxistina neteweyên yekgirtî roja 19ê hezîranê wek roja nehêlana şîdeta sêksî di nakokîyan de û piştgirî li qurbaniyên wê kiryara nemerivane destnîşan kiriye.

Li wan çend rojên bihorî de, piştî ku dezgeha ragehandinê a Brîtanya (BBC) çend belgeyên fermî liser destdirêjiya çend mohreyên rejîma Îranê bo ser «Nîka Şakeremî» li dema binçavkirina wê li dema serhildana «Jin, Jiyan, Azadî» de, bidest xistin û ew yek bû mijarek girîng û sereke li zaf meydayên cîhanî û navxweyî de, girînge ku bal bo ser wê mijarê were kişandin, tevî ku xwezaya vê rejîmê ji bo me hatiye îspatkirin û karbidestên rejîmê bi xwe jî wê yekê ne tenê înkar nakin, lê bo xwe bi şanazî dizanin û bi eşkere bas lê dikin.

**Şîdeta sêksî yêkek li amûrên îşkence û bêhêvîtîkirina girtîyan e ku dezgeha ewlehiya rejîma Îranê bi salan e wê zanebûn hember dijberên xwe bikar tîne. Destavêtina ser girtîyên salên 80an a zayînî, destavêtina serdema serhildana «bizava kesk» û destdirêjîkirin li ser girtîyên şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» nimûneyên wê kiryara gemar, nemerivane û dûr ji exlaq a karbidestên rejîma komara Îslamî e.**

Karbidestên rejîmê bi salan meseleyeke Çînîyan a kevnar nav xelkê de bilav dikirin ku dibêje: “eger destavêtne te û te nekarî berxwe bidî, berxwe nede û li keyfa xwe binihêre!” Ewan bi wê propagandayê dixwestin ku xelkê ji aliyê derûnî hazir bikin ku eger hat û hatin girtin û ew yeka bi serê wan de hat, çarenivîsa xwe qebûl bikin. Li ber ku baş dizanîn ku bandora wê yekê yê liser girtîyan çi be û yê çawa wan bişêne ku nekaribin carek din li hember rejîmê de serî rakin. “Nîka Şakeremî” tam berevajî wê doktrîna rejîmê bertek nîşan da û bi gorîkirina canê xwe, hemû pîlanên rejîmê têkdan. Ew yeka karek mezin e û li ruhek serhildêr û şoreşger tê çaverêkirin.

“Nîka Şakeremî” bi gorîkirina canê xwe, carek din da eyankirin ku destdirêjîkirna ser girtîyan di sîstema desthilatdariya rejîma dijemerivî a komarî Îslamî de, karek bi rêkxistinkirîye û mohreyên rejîmê wê yekê wek parek li erka xwe ya rêkxistinî dizanin û cîbecî dikin. Ew wî karî li ser bingeha vergirtina hukmê “Fetwa” li dehan mela û rêberên olî yên rejîmê dikin û xwe re eyb û serşorî nahesibînin. Ew wî karî ne tenê li dijî girtîyan û kesên dijber, lê li hember hew jî dikin.

Li ber ku bikaribin li ser hev jî xalên qels û lawaz peyda bikin û bi wê hecetê hew bi temamî bêxin xizmeta armancên rejîmê. Lê ewa ku ew li hember hev dikin û ewa ku ew li hember kesên girtî dikin, du tiştên li hev cihê ne.

Dibêjîn ku baştirîn çek li hember şantajê, aşkerakirin e. Ew yeka bûye sedem ku di wan salên derbasbûyî de mentalîteya xelkê were guhertin. Pêştir ku xelkê destdirêjîkirin dikirin eyb û îrad bo ser kesê qurbanî, niha tam berevajî wê yekê, kesê destdirêjîker lome û sûçdar dikin. Ew yeka jî alîkar bûye ku hem kesên girtî û hem jî malbatên wan wekirîtir bas li serpêhatiya xwe bikin.

Berxwedana “Nîka Şakeremî” û xwe destve bernedana wê û niha jî eşkerebûna bêhtir a rastiyan da eyankirin ku ew du caran bû qehreman: Berxwedan li hember mohreyên destdirêjîker yên rejîmê ku bi wî karê xwe nehêla ew gemarên nemeriv kesayetiya wê bişkênin û li aliyek din jî, her wek ku mezinan gotî: “xo roj heta qiyamet li pişt evran de namîne”, bi eşkerebûna rastiyan niha rejîm li her demekê zêdetir rezî û serşor bûye. Rejîmê bi hemû îmkanatên xwe, nekarî pêşiya rastiyan bigre û ew yeka jî serkevtina berxwedana “Nîka Şakeremî” e.

Ew dersa ku dibe hemû kesên şoreşvan li wê berxwedana “Nîka Şakeremî” verbigrin ewaye ku berxwedan serkevtinê diafirîne. Ew bi berxwedana xwe li hember pergala tûtalîter a destdirêjîkeran bi ser ket û ew serkevtina bû parek li dîroka berxwedana azadîxwazîyê û ew dîrok jî jidayikbûneke nû ye bo “Nîka Şakeremî” û hemû qurbaniyên şoreşa “Jin, Jiyan, Azadî”!





# Rewşa aboriya Xorasanê



N: Rojan Kurmanc
W: Hesen Mukerem

Xorasana Bakur li bakûrê rojhilatê Îranê ye û piraniya xelkê wê kurd in û hejmareke kêm ji wan jî Tirkmen û faris ziman in ku bi derbasbûna demê re koçî Xorasana din a Rezewî kirine. Nifûsa kurdên Xorasanê nêzîkî 3ê milyon kes e.
Li vê parêzgehê 33 cure çandinî û 26 cure berhemên bexçeyê tên berhemanîn ku ji wan girîngtirîn genim, ceh, once, silk, gulberoj, nuk, fasûlî, nîsk, pîvaz, xiyar, pembû, tirî, sêv. , gûz, û gêlas. Lê tevî van hemûyan jî ev parêzgeha di rêza yek ji parêzgehên herî bêpar û kêmdahat ên welat e, wek Sîstan û Belûçistan û Kurdistanê.
Rêjeya bilind a enflasyonê û bêkariyê bûye sedema koçberiya xelkê herêmê bo parêzgehên din.

**Sedemên bêkariyê**
**1_ Hişksalî**
**2- Li gel zêdebûna nifûsê ne afirandina derfetên kar ên nû**
**3- Wêrankirina yekîneyên berhemanînê yên berê**
**4- Heqdesta kêm û gelek caran paşxistina heqdesta karmendan bo çend mehan**

## 1_ Hişksalî

Ji bilî ku sedema bêkariyê bûye sedema koçberiya gundiyan jî hewaya nerm a çiyayî û axa bi bereket rewşek baş ji bo cotkar û baxçevanan peyda kiribû, lê harî xerab ku di van du dehkên dawî de ji ber kêmbûna baranan em şahidê hişksaliyên e di vê herêmê de ku piraniya cotyar û baxçeyan bi neçarî wirbibn koçber lê ya herî xerab eve ku ji ber kirêya zêde a avahiyan di bajarên mezin de dubare xelk bi neçarî vedigerin bo gund û bajarên piçûk.
Lê gelek faktorên mirovî bûne sedema hişksaliyê, wek avakirina bêprensîb bendavan û nebûna sektora çandiniyê ya nûjen.

Rûbara Etrak bi dirêjahiya 669 kîlometran pêncemîn rûbara herî mezin a welat bû û bi avakirina bê prensîb a bendava Burzû û çêkirina çend bendavên din ên biçûk li ser vê rûbarê, ji bilî têkdana ekosîstemê, em dibin şahidê dawîn henaseyên vê rûbarê.

Demek berê, ev rûbara han wisa pir av dibû ku rêya rûbarê di hundirê bajêr de jî tijî av dibû û di dema baranê de bajar tijî dibû, lên niha tendê gundî dikarin mifahê ji ava rûbarê verbigrin û rûbar di nav bajêr de bi temamî hişk bûye, û em tenê di dema barîna baran de di nav bajêr de hinek av li ser rêya rûbarê dibînin.

## 2_Bi zêdebûna derfetên kar ên nû di gel zêbûna nifûsê

Di civakên serketî de, ligel zêdebûna nifûsê, em derfetên kar ên nû jî dibînin, lê mixabin ev yek li vê parêzgehê çênebû, û ligel bêkariyê, enflasyoneke bilind jî dibînin, ku bi giştî enflasyon û bêkariyê ye. nîşana hejariyê, ku nîşanek aborî ye.

## 3_ Hilweşandina yekîneyên hilberînê yên berê (fabrîkaya fiber û kargeha şekir)

Fabrîqeya fiber: Ne tenê yekeyên hilberînê zêde nebûne, kêm jî bûne. Fabrîqeya fiberê ya Şîrwanê ku di sala 1343an a Rojî de hatiye damezrandin, mezintirîn yekîneya berhemanîna fiberê li rojhilatê welat bû, ku niha bûye wêrane û tevî sozên dubare yên berpirsên dewletê û parêzgehê ji bo



jinûve vekirina fabrîqeya fiberê li vê derê şêneya Sipêhirê hatiye bicihkirin.
Sala borî em bûn şahidê hûndur bûna 17 barhilgiran bo nav fabrîqeya fiberê, ku bi gotina berpirsan ew bû ku kargeh ji nû ve dest pê bike, helbet her mirovekî biaqil dizane ku berî her tiştî divê kargeh were çêkirin û dûv re jî pêdivî ye ku kargehê ne derî û ne ban û tiştek din heye.

## Kargeha Şekir a şîrvan:

Ev kargeha ku di sala 1337`an aRojî de hatiye damezrandin, karekî guncaw ji karkeran re peyda kir, hevdem ligel zivirandina çerxa vê yekîneya berhemanînê, bajar tijî deng bibû.
Barhilgirên ku li bajêr li dû hev rêz dibûn da ku karkerên ku ji cotkar heta fabrîqeyê, ji çandiniyê bigire heta çinîn û barkirina silkan, qehwexaneyên ku karkerên febrîqeyê yên li bajêr mazûvanî dikin, tiromibîlên ku karker dibirin û hemû ev yek ji ber nebûna karê vê yekîneya hilberînê winda bû.
Niha ev kargeh bi qasî pênc sed kesî demsalî dixebite.

**4**- Ji faktorên din ên lawazbûna aborî û koçberiyê, em dikarin behsa kêmbûna heqdest û gelek caran paşxistina çend mehan ji heqdestên karmendan bikin, lê li bajarên din jî du qat heqdest ji bo heman hêza kar tê hesibandin.

## Gotina dawî

Aboriya geş dibe derfetên nû yên kar dirust dike û rêjeya enflasyon û bêkariyê kêm dike û di encamê de serxwebûna aborî û wekheviya dahata xelkê zêde dibe û di encamê de tenduristiya derûnî û laşî û hêviya paşerojê zêde dibe.
Lê berovajî vê yekê, em li bêkariyê digerin û em dibin şahidê hejmareke zêde ya tûşbûyên bi madeyên hişber, xwekuştin, telaq, biçûkbûna sifreyên xelkê û jidestdana tenduristiya derûnî û laşî ya xelkê.




## Nerîna




**“Xalid Ezîzî”:**

**“Xalid Ezîzî: Pişta me bi xelkê Kurdistanê gerim e û bi hêvî ve şiroveya guherînan dikin”**



**“Maria Zakharova”:**

**“Maria Zakharova: “Divê em qebûl bikin ku NATO bi ciddî xwe ji bo pevçûnek gengaz a bi Rûsayayê re amade dike”**



**“Jake Sullivan” :**

**“Jake Sullivan :Eger Erebistana Siûdî û Îsraîl li ser asayîkirina peywendiyên xwe li hev nekin, Washington dê bi Riyadê re peymana leşkerî îmze neke”**



**“David Cameron”:**

**“David Cameron: Ukrayna dikare bi çekên Brîtanî êrişî Rûsyayê bike”**

# Alman zêdetirî berê girîngiyê dide çand û zimanê Kurdî!



**N. Eskender Ceiferî**




Di heyamên derbasbûyî de bi awayekî fermî du saziyên ser bi dewleta Almanya, dest bi karên xwe bi zimanê Kurdî kirin.
Tora ragihandina pirrengî li Almanya karî ji bo du salên din jî bûdceyê ji xwe re bistîne.
Herwisa biryar hate standin ku êdî xelk bikare bawernameya ajotinê bi zimanê Kurdî derxîne.
Ev jî piştî daxwaza xelkê ji bo beşdarîkirin di ezmûnan de bi zimanê Kurdî derket rojevê û hate pejirandin. Ev çend sal bûn ku hejmareke çalakvanên Kurd ji dewleta Almanya dixwastin vê biryarê bistîne û niha jî bi pejirandina biryara dayîna ezmûna bawernameya ajotinê bi zimanê Kurdî, deriyên mezintir ji bo zimanê Kurdî têne vekirin.
Ji bilî vê, dana pere ji bo projeyên bi zimanê Kurdî jî li Almanya berfireh bûye.
Biryar e tora bi navê Tora Pirrengî, heya dawiya sala 2025'an xebatê bike û pişt re jî dibe ku careke din dewleta piştevaniya wê bike.
Di salên derbasbûyî de li Almanyayê toreke rgaihandinî bi piştevaniya dewletê hate ragihandin ku tê de zimanê Kurdî jî li kêleka zimanên hin neteweyên din cih digire. Navê wê, Tora ragihandinê ya pirrengî ye!
Vê torê di daxuyaniya xwe de ji xeynî zimanê Almanî, cih daye pênc zimanan ku Fransî, Erebî, Ingilîzî, Kurdî û Potrogalî li xwe digire.

Di daxuyaniya destpêkê ya karên vê torê de hatiye: Em çalakvanên ragihandinê bi pêşîneya koçberî yan jî penaberiyê ne û hertim hest bi rastgirî yan jî nijadperestî û newekheviyê dikin. Li ser me gelek tê axaftin lê belê ne bi me re. Em xelkê bi projeyên ragihandinî re li hev girê didin û dengê xwe hildidin û destêwerdanê dikin. Em bi perwerdekirin û lihevguhertina nerînan, hevdu xurt dikin. Emê bikarin ji bo her kesî toreke cûrbicûr û pirreng biafirînin.
Girîngiya vê torê ji bo Kurdan ev e ku zimanê Kurdî jî, li kêleke hin zimanan cih girtiye ku xwedî dewlet in û di asta navdewletî de jî têne bikaranîn.
Di beşeke din ji Em dixwazin bi hêza ragihandinê, bêne guhdarîkirin û xwe têgihiştî bikin û meyl û heza kesên din jî, ji bo vî karî zêde bikin. Em xwe ji bo tevlîbûn bo guhertinên demdirêj û berfirehkirina ragihandinê, berpirsyar dibînin. Armanca me, civakeke vekirî, pirreng û mayînde ye. Tora ragihandinê ya pirrengî, tora me ya nû ye ku ne tenê girêdayî çandekê ye. Em ragihandinkarên ji welatên cuda, zimanên cuda û dîrok û pêşîneyên cuda ne.

Ew dixwazin civakeke pirreng li vir pêk bînin. Lê ji ber ku ev cara yekemîn e saziyek ku bi piştevaniya dewletê tê avakirin û li zimanê Kurdî jî xwedî derdiekve, Kurdên Almanyayê jî pêşwaziya wê dikin. Vê torê di berdewamiya daxuyaniyê de ragihandiye ku em dixwazin jiyana xwe ya dilxwaz nîşan bidin. Em her tişta ku bandorê dike ser me, dikin raport û dîtin. Em nerînên nû derbasî nav ragihandina Almanî dikin.

Em dixwazin ji bo pêkanîna gotûbêjan li ser mijara koçberî û penaberiyê alîkar bin ji ber ku ev mijar, pêwendîdarî me ye jî. Di van bernameyan de ku em çê dikin, em li ser mijarên siyasî û civakî li Almanyayê bo cîgir û altêrnatîvên cuda diaxivin. Gelek ji wan mijaran, derbarê me ne. Lê belê em xwe di penaberbûnê de yan jî tenê bi tiştên girêdayî civaka xwe sînordar nakin; Em helwestên xwe tînin ziman lê em dixwazin nîşan bidin ku em kî ne! Lewma jî serpêhatiyên cuda, bandorên çandî û herwisa nûçeyên derbarê rewşa niha jî, ji me re girîng in.

Ew jî nîşan dide ku pirrengiya niştimana her kesî û girêdanên wê, dikare pêwendiyan navbera dunyaya cuda ya her yek ji me pêk bîne û sînoran jî derbas bike. Em dixwazin ew tiştên ku em bi xwe re tînin û hebûna me, wek xwe, bên pejirandin.
Erê, rast e û Ewrûpî dizanin êdî Kurd bûne beşek ji rastiya Rojhilata Navîn. Lewma jî ew Kurdan û zimanê wan, derbasî nav pirojeyên bi vî rengî dikin û dibêjin pirrengiya pêşîneya me, me derbasî nav rewşekê dike ku bi nerîneke cîhanî, lêkolînê li ser encamên niha, piroseya koçberî û penaberiyê û herwisa stratejiyên siyasî û netewî bikin. Û bikariin karên perwerdehiyê bikin. Me bi ekterên saziyên penaberan û hinek saziyên din ên civakî re pêwendiyeke baş heye ku piştevaniya me dikin.

Em vê torê weke odeyek ji bo hemû mirovan jî binav dikin ku dixwazin ezmûna xwe li ser kiryarên newekhevî parve bikin bêy ku rastî êrîşê bên yan jî li ser kesatiya xwe biaxivin. Belkî wek çawan faşîstên Tirk dijatiya danînna zimanê Kurdî ji bo Facebook û Google jî kiribûn, dijatiya vê jî bikin. Lê van saziyan biryara xwe standine û di karên xwe de jî, ji bo zimanê Kurdî berdewam in. Ew dibêjin, bi pirrengiya mirovan û pirojeyên bi vî rengî, em xwe û hevdu bihêz û xurt dikin û rê didin ew mijarên me zêdetir li ber dest bin.

Dawiya daxuyaniyê jî, wan basa perwerdekirina rojnamevanan kiriye û dibêjin, di riya vê torê re, em dikarin pêwîstiyên têknîkî, madî û rêkxistinî pêk bînin ji bo ku bi pêkhateyên cuda yên rojnamegeriyê hem hevdu perwerde bikin û hem jî bêne perwerdekirin. Bi vî awayî jî wê bi pirrengiya reftaran, karên me yên hevpar, hevbendiya me û lihevguhertina nerînan bi awayekî giştgir bihêz û xurt bibin.

# Çanda daxwaza lêborîn kirinê



N. Vênûs Fayîq
W. Hesen Mukerem



Ewrupî bi giştî û Holendî bi taybetî, xwe berpirsiyar dibînin ji ber şaştiyên bav û kalên xwe.

Ew amade ne ku lêborînê bixwazin ji ber sûcên ku wan nekirine an ku di wê demê de li ser desthilatdariyê bûn, lê ew di sedsalên 15-16-an de qewimîn.

Mînaka herî nêzîk, di sala 2002`an a Zayînî de, serokwezîrê Hollanda Wim Koke ji ser kar vêdeçûna tevahiya kabîneya xwe pêşkêşî Qral Piatrix kir, piştî ku rapora dawî ya komîsyona lêkolînê nîşan da ku hêzên aştîparêz ên Neteweyên Yekbûyî yên Hollandî nekariye pêşî li komkujiya 1995`an bigire.

Di şerê Bosnayê de, yek ji şerên herî hovane yên li Balkanan li dijî Mislimanan, ku herî kêm 7 Hezar û 500 misilman hatin kuştin.

Ev bûyer di serdema Vim Cook de rû nedaye û ti kesî ew neçar nekiriye ku dest ji kar berde, lê erkek exlaqî ya bilind bû sedem ku ew helwestek bigre nav dîroka siyasî û dîroka desthilatdariya wî xweştir bike.

**Ew gava wezaretek an dezgehek xizmetguzarî bi welatiyan re şaştiyekê bike jî, ew ji bo cezakirina kiryaran ranawestin, lê ji ber ku hukûmet xwe ji xemsariyê bêpar nake û helwest digire**

wekî ku di sala 2021`an a Zayînî de Mark Rutte ji ber şaştiyeke dezgeha bacê ya di warê zarokan de ku bi sedema wê hejmarek pir li dêv û bav zirarê bibînin, helwestek girt û dev ji kar berda.

**Helwestên bi vî rengî baweriya gel bi hikûmeta xwe xurt dike û têkiliya gel û desthilatdaran kûrtir dike.**

Ya herî balkêş, roja Şemiyê, Padşayê Hollandayê Willem Alexander bi fermî ji ber tevlêbûna bav û kalên wan di koletiyê de lêborîn xwest, li dûv wê serokwezîr Mark Rutte lêborîna xwe xwest ku Hollanda xwediyê dîrokek koletiyê ye.

**Lêborîn bi serê xwe çandeke mirovî û siyasî ye, çi armanca wê çi dibe bila bibe, çi siyasî be, çi şiyarbûna wijdanê mirovî be, lê divê em li ber xwe bidin û bilind binirxînin.**

Di sala 2021`an a Zayînî de, hikûmeta Fransa bi fermî berpirsiyariya xwe ya şerê navxweyî yê Ruandayê û tawana zayendî ku li dijî kêmaniya neteweya Tutsî li wî welatî hatî kirin, qebûl kir, berê jî Fransa bi heman awayî di helwestekê de ev yek qebûl kir ku Fransa ew hemû karesat û tawanên dagîrkerî li Cezayêr de di serê xelkê de anîne.

Niha pirs ev e: Ma em nikarin di vî warî de bi kêmanî li herêmê bibin pêşeng û lêborîna xwe ji gelê xwe bixwazin ji ber şerê navxweyî yê ku bi ser gelê Kurd de hatiye, daxwaza lêborînê ji ber vê yekê ku piştî raperîna 1991`an a Zayînî bala xelkê kişandin lê ya ku ji bo wê têkoşîn kirin ti tiştek bidest neketiye û jiyan û bijêva xelkê çiqas ku derbas dibe xirab û xirabtir dibe û rêjeya destkurtî û paskirin bilindtir dibe, niha xelk hîn jî xewna mûçeyek tam û bê birîn û jiyanek bi rûmet piştî hemû têkoşîn û xwîna ku bi rêya rizgariya Kurdistanê pêşkêşî neteweya xwe kirine, bi kêmanî baweriya milet vegere?



# Rengê Xwedanî Li Ser Desthelatê



N. Hasan Harrani



Ev rastîyekîye ku ev hêza Xwedanî îcadekî beşerîye û cara pêşîn li vê axê derketîye. Li ti deverekî cîhanê wkî ku li rojhelata navî çêbûye hêza Xwedayî û raman û bawerîya Xwedayî û ramana desthelatdarîyê derbasî bava hevudu nebûye û di nava hevudude nehatîye rêsandin û hinandin.

Li rojhelata navîn teslîmîya ji hêza desthelatdar, îtîata ji hêza destheldar û ya Xwedayî yekin. Bikaranîna yek hukmî tê zanîn tê famkirin û tê bawerkirin. Lewre desthelatdarî wek emîratul zîlulallah tê pênasekirin. Ev jî kifşa sêyemîne.

Gotina ku dibêje “ Siltan sîya Xweda ya rûyê erdê ye. Kîjê re îkram bike Xwedê jî ji wî re îkram dike, kî jî lê xêyanet bike Xweda jî li wî xîyanet dike” ne gotinekî serdema Îslamê ye. Ev zanînekî pir qedîme û di rih û gêyane hişmedîya rojhelatanavîn de ji berêde hatîye bi cîhkirin.

Yên ku kifşa vê hêzê kirin baş dizanîbûn ku ev hêz li ser hiş û ramana civakê çawa bandor dike û çawa dikare bibe hêza kontrolkirinê. Honandina gotinê li gorî hêza ku hatiye teswirkirin xala herî giring bûye. Ji ber vê yekê herî pêşîn girîngî dane teşe û bezmandina gotinê li gorê hêza ku hatiye kifşkirin.

Îcad û kifşa afirandina hêza îlahî a pêşîn ev e. Bi gorî aqilê hêza desthelatdar Îlahîyat û civak divê bi hevudure pêşde here û her ku civak pêşde çû bezmandina îlahîyatê jî gavek li pêşîya pêşketina civakê bê xemilandin û kemilandin.

Ev jibo ferqnekirina çêkerîya beşer ya teswîra Xweda xalekî pir girînge. Lewre ev afirînerîya beşer a Xwedayî ger li gorî civakê li paş bimîne îhtîmala deşîfrekirin û bêwatebûna wî heye. Loma jî Xweda an jî îlahîyat herî zêdetir ne hêza civakêye, ew hêz û piştevanîya desthelatêye. Desthelat ji destpêkê de xwe wek temsîlhatina wicudê ya Xwedayî teswîr kirîye û di binê hişê civakêdr bi cîh kirîye.

## Girtina Rengê Xwedayî ya Hêza Desthelatdar

Li vê erdnîgarîyê di destpêkê de hêza herî xurt û teslîmgir ol e. Îlahîyat ji destpêkêde hebe jî honandin û xemilandina kelama wî pir paşê hatîye wicûdê. Di destpêkêde ev wekî çîrok, mesel û fermanên jîyanewerî bên tezmînkirin jî, di serdemên gelek pêş de bi pêşketina ziman, gotinê û ramanê de, ev sûda herî mezin dîsa daye kelama Xwedayî.

Li ser navê Xweda bêhtir gotin û îzahên di her alîyê jîyan û civakê de ferz hatîye dîtin, bi destê desteyên afirînerîyê yn taybet û pispor mesel û çêkirina kelamên Xwedayî hatina nivisîn û amadekirin. Ev sazkirina desteyên afirandina kelaman ta ji dema Somerîyan de hebûye. Di serdema cihûyan de desteya Levîyan mînaka herî girînge û di bîra mirovdeye. Di wir de raste rast û vekirî dibêje ku ev deste bi Xweda re di têkilîyêdene û gotinên wî tomar dikin.

## Ev çîye?

Ev afirandina olê a bi destê mirov e. Lê tenê şaşkirina hişê mirov di vir de heye ew jî qaşo vana bi Xwea re di têkilîyêdene û gotinên wî tomar dikine.

Xala herî girîng eve ku zincîra herî neşiker eve ku bi vî awayî hatîye îcadkirin û ti car jî civak nikarîbûye vê tilsimê betal bike. Îro jî civaka rojhelata navîn sedî heştêyî êsîr û girêdayê vê zanîna şaşe.

## Vîna Mirovan Hatîye Şikandin

Bi îcada hêza Xwedayî û bi lêanîna vîya a li ser civak û jîyanê vê yekê bi civakê daye qebûlkirin. Rûyê desthelatê bi rû û hêz û emrê xwedayî hatîye nixumandin.

**Ol jibo vê hêzê hemî derfet û alîkarî daye vê hêzê û ev heza desthelatdar pişta xwe daye vê hêza gotina Xwedayî. Ev di kûrahîya rihê civakê de hatîye qebûlkirin û civak û mirov ti car ew hêz û bawerî di xwe de nabînin ku bi bawerbûyî bêjin ev şaşe û veguherînin lehê xwe.**

Bawerî û tesewira Xwedayî hema bêje di rihîyeta her mirovî de li ser rûyê cîhanê heye. Lê ti deverî bi qasî civaka rojhelat ev tişt bi awayekî ku mirov û civakê ne tişt bihesibîne û hêza desthelatdar jî xwedî îmtîyaz nîşan bide nîne. Ev wekî emrekî îlahî hatîye destnîşankirin û di binê hişmendîya civakê de jî bi hezarê salane ev hatîye bicîhkirin.

Ol û bawerî, îlahîyat û emrê xwedayî hemî jibo parastina desthelatê hatîye tezmînkirin. Jibo wan bûye îmkana xwedîyê her tiştî û jibo mirovan û civakê jî bûye emrekî îteatî, bîatê û şikirkirin û hebandina ew çîna xwedî îmtîyaz.

Civak bi vî awayî hatîye teşekirin. Delîl û îspata vê yekê li nava civaka me de hebûna bi hezaran terîqet û li ser serê vana jî bi hezaran şêxên sextene ku di ti hilberîn afirînerîya kar û barê civakî de nînin.

Li bazirganîya ol û bawerîyê bi tevî deh hezaran nifûsa malbatên xwe ve li ser pişta civakê xweyî dibin. Ev rastî di jîyan û qada sîyasetan de mewcûde.

Di binê mejî û hişê mirovên rojhelata navîn de xwesteka azadîyê jibo jîyana li rûyê vê cîhanî nîne. Ti bixwazî vê zanînê bidîyê jî, ew emr û hişmendîya îteatkar û xwe teslîmkirina Xwedayî di binê şanikên mejîyê wî de ewqas xurt û qaîme bi bîrxistina yek gotinekî olî û qaşo xwedayî hemî zanîna te daye pûç û vala dibe. 360° dereceyî dizivire dibe murtedekî baş.

Tirsandina bi wê cîhana ne dîyar û xeyalî ji wî ji hemî mafê wî yê xwezayî dizivirîne û heta wî ji hemî derfetên jîyanê bêpar dike. Sedema vîya ne ku heqîqet eve. Bawerîya şaş û şaşfamkirina heqîqetêye. Heqîqet ewqas şaş hatîye famkirin ku şaşî û rastî di şanikên mejîyê wî de û di plaka hişmendîya wî de cîh guherandîye.

# Rewşa Kedkarên Kurd li roja Cîhanî a Kedkaran de



N. Nûredîn Sofîzade



1ê heyva May Cejna Kirêkar û zehmetkêşênane ku di vê rojê de zehmet û ked û rolê wan tête rêzgirtin.

Roja bîranîna Têkoşîna karker û xebatkaran e û li piraniya welatên pêşkevtî de di vê rojê de hem deshilat û xelk rêzê ji bandora karkeran digre, û hem xudî karker cêjnê digrin û li kêlega vê hilkevtê de bi li dar xistina rêpîvan û merasiman daxwaz û xwestekên xwe bi awayekî serbest tînine ziman.

Lê di welatên paremayî û li jêr deshilatên rêjîmên dîktator de, hertim kedkar hatine tepeserkirin û heta îzna merasim û rêpîvanê jî bi wan nayête dan û berdewam têne çewsandin û ji mafê berheqe xwe bêbarin û tu giringiyek bi rol û zehmeta wan nayête danê.

Ji bo diyarîkirina rojekê bo rêzgirtin ji keda karkeran, encamê de Enternasyonala 2êmîn di 14-21 Tirmehê 1889-an de civiya, bi pêşniyara karkerekî Firansî 1ê May li hemû dinyayê wek "Roja Hevkarî û Têkoşîna Karker û Xebatkaran" pesend kir.

Karker û xebatkarên dinyayê di encama têkoşîna xwe de mafê rojê 8 saetan kar bikin qezenç kir. Lewma jî 1ê may wek roja hevkarî û têkoşîna karker û xebatkaran, Roja Cejna Karker û Xebatkaran li dinyayê pesend bû.

Di vê qonaxê de jî ne bes li welatên sosyalîst li welatên kapîtalîst jî Cejna Karkeran 1ê May bi awayekî kîtlewî tê pêroz kirin.

Mixabin di pirozkirina 1ê May de gelek karker û xebatkar û zehmetkêş û şoreşgeran jî jiyana xwe di rejîmên totalîter û faşîst de wenda kirin û hatne tepeser kirin.

Ji aliyê din de jî sosyalîstan û demokratên civakî û şoreşgeran 1ê Mayê ji bona berjewendiyên xwe yên îdeolojiyê bi kar anîn. Ew jî bû sedem ku têkoşîn û hevkariya karkeran zirar bibînin û bibin sedemên rikeberiyan ku gelek kes brîndar bibin û bên kûştin.

**Wek tê zanîn sosyalîstan, neteweyên bindest û kolonî wek bervankarên Karker û Zehmetkêşan; têkoşîna neteweyên bindest yên rizgarîxwaz jî tîfaqa têkoşîna karker û zehmetkêşan qebûl kirine.**

Lewra Neteweyên bindest û kolonî bi hemû çîn û sinif û hemû aliyên xwe yên civakî bindest, belangaz in, ji hemû mafên xwe bê par in.

Rêkxistin û saziyên çep li Îran û Rojhilatê Kurdistanê de ku bi diruşma berevanî ji mafê zehmetkêş û karkeran li 40 – 50 salên derbasbûyî de bi hinek diruşmên çepger û modern karîn heya qasekê bandorê li ser zehmetkêşan dabinên û wan li dewra xwe kom bikin, lê di dawiyê de û bi derbasbûna zeman, xuya bû ku ev jî tenê bona geheştin bi deshilat û berjewendiya xwe dixwazin mifahê ji hêza zehmetkêşan wergirin û wan bi kar bînin.

**Ezimûn û ceribandina deshilatê û bi berçavgirtina rewşa zehmetkêşan li welatên ji deshilata rêjîmên jev cudaye Dîktatorî û Dêmokrat de, îsbat dibe ku heya mafê azadiyê, wekhevî, dêmkrasî û hikûmeta xelkî çinebe, tu mafek ne tenê bo karkeran, belkî bo çi yêk ji qatên civakê çinabe.**

Îro em dibînin ku welatên rojavayî, bi taybetî li Ewropa de, ku navenda mafê mirov, dêmokrasî û wekheviyê tête hisabê, maf û azadiyên Kirêkaran livê ji hemî wan welatan çêtir û baştire ku deshilata wan welatan xwe çep û berevankarê mafê zehmetkêşan dizanin.



Kirêkarê me yên Kurd jî divê vê yêkê baş bizanin ku maf bi diruşman nîne, belku bi kiryar tête danê.

Mafê karkerên Kurd weke yêk ji qatên civaka Kurdistanê dê di demekê de bidest ve bêt, ku Kurd hebxwe hakimê xwe be û Kurdistan li jêrdestiyê xelas bibe, vê demê deshilat û dewleta Kurd dikare weke qateke zehmetkêş mafê kirêkaran û hemî civakê dabîn bike, Kurd û Karkerên Kurd li vir şûn de hemî hêza xwe divê bêxne ger bo evê ku li serî de mafê netewî bidest ve bînin, hingê Karkerên Kurd dikarin bi serbestî û azad hemî mafê xwe dabîn bikin û ger nebe, aliyê kêm karkerên Kurd ev mafe hebin ku rêpîvan û merasiman li dar bêxin bo bas kirin li maf û daxwazên xwe yên sinfî.

Rêxistinên Kurdistanê bi hemî aliyên xwe yên çep û rast û netewî û bi her îdolojiyekê, pirsa netewî pirsa herî girîng be bal wan û divê rêka dabînbûna mafê karkeran û hemî qatên civakê li rizgariya netewî de bibînin û kar bo vê yekê bikin.

Divê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û li Hemû beşên Kurdistanê 1ê Mayê bixin xizmeta Rizgarî û Azadî û Serxwebûna Kurdistanê, xebat li pêxema dabînkirina mafên neteweyî.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## 14 welatiyên xelkê bajarê Şinoyê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatine binçavkirin



Li heyama çend rojên derbasbûyî 14 welatiyên xelkê bajarê Şinoyê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatine binçavkirin.

Pêka raporta "Kolber News"ê li çend rojên derbasbûyî de hêzên ewlehî yên rêjîma Îranê "Yûsif Hacî Xoş, Selah Qazî, Hisamedîn Mehmûdî, Mihemed Sultanpûr, Xefûr Şêx Mihemedî, Ceifer Resûlî, Hesen Resûlî, Mewlûd Rûsta, Hadî Lave, Ako Îbrahîmî, Omîd Reşîdpak, Fexredîn Moderrsî, Selah Qazî û Arman Îbrahîmî, ên xelkê bajarê Şinoyê ji aliyê hêzên ewlehiyê yên rêjîmê ve hatine girtin û bo cihê nexuya hatine veguhestin.

Pêka raporta "Kolber News"ê, 6 welatî yên bi navên "Hesen Resûlî û Mewlûd Rûsta xelkê gundê Hesen Nûran, Mihemed Sultanpûr xelkê gundê Dehşems, Xefûr Şêx Mihemedî yê temen 50 salî xelkê gundê "Aliyawa" û Cefer Resûlî temen 36 salî xelkê gundê Bêmzortê, Ako Îbrahîmî xelkê gundê "Alkawê"(Eliyawa) ji aliyê hêzên îtilaata spaha pasdaran a terorîst ve li bajarê Şinoyêhatin girtin.

Heta dema amadekirina wî nûçeyî, ti zaniyariyek li derheq sedem û tohmeta ku ev kesane li ser hatine binçavkirin, ber dest nîne.

## Rêjîma Îranê 15 rojan de, li her 5 demjimêran de binçavkiriyek bidar vekiriye



Hejmara bidarvekirina binçavkiriyan ji aliyê rêjîma Îranê ve bi berhevdan digel heyva Adarê a Zayînî %328 zêde bûye û li heyva Nîsanê de zêdetir ji 77 binçavkirî bidar vekirine.
Pêka raora "Hengaw"ê rêjeya bidarvekirinan li heyva Nîsanê de bi berhevdan digel heyva Adarê, %328 zêde bûye û vê pêkê rêjîma Îranê li heyva derbasbûyî ya zayînî de zêdetir ji 77 binçavkirî ku 3 ji wan jin bûne, li girtîgehên rêjîmê li seranserê Îranê de bidar vekirine, ew yeka li halekê de ye ku li heyva Adarê de 18 binçavkirî ji aliyê rêjîmê ve hatibûne bidarvekirin.
Pêka vê raporê 2 heftiyên derbasbûyî de 63 binçavkirî hatine bidarvekirin, vê pêkê serhev li her 5 demjimêran de kesek hatiye bidarvekirin.
Pêka rapora "Hengaw"ê li girtîgehên rêjîmê de li parêzgeha Xurasanê 16 kes hatine bidarvekirin ku zêdetirîn rêjeya bidarvekirinan li nav parêzgehên Îranê de li vê heyvê de hebûye, û li vê rêzbendiyê de parêzgehên "Elborz, Îsfehan, Kirman û Tewrêz"ê zêdetirin rêjeya bidarvekirinê li heyva derbasbûyî ya zayînî de hebûne.

Piraniya kesên bidarvekirî bi tohmetên pêywendîdar bi madên hişber bûye û ragihandinên ser bi rêjîmê tenê 4 haletên bidarvekirinê belav kirine.
Li vê derheqê de Birêveberê Saziya Mafê Mirove Îranê "Mehmûd Emîrî Muqededem" gotiye ku rêjîma Îranê bi armanca tirsandina xelkê û rêgirî ji xwenîşandanên nerizayetî li sala derbasbûyî de 471 kes bidar vekirin.

## Hêzên çekdare rêjîma Îranê, li hember kolberan de cinayetên zêdetir dikin



Hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îranê bi zanebûn bi gulleyên saçmeyî teqe li çavê kolberekî temen 17salî kirine û metirsiay korbûna çavên wî heye û herwisa kolberekî dinê jî li sînorê Newsûdê bi dijwarî kurtane.

Pêka raporên belavbûyî, roja Înê 14ê Banemerê, hêzên hov ên rêjîma Îranê li sînorê bajarê Serdeştî de bi zanebûn teqe li çavên "Ariyan" ku kolberekî temen 17 saliye kirine û metirsiya korbûn û jinavçona her 2 çasvên wî heye.

Aryan ê temen 17 salî, xelkê gundê "Sawan"ê ser bi bajarê Serdeştê ye û bo çareseriya pizîşkî bo nexweşxaneyê hatiye veguhastin.

Herwisa li sînorê Newsûdê de jî kolberek bi navê "Şehram ku nasnavê wî nehatite zanîn ê xelkê Şahoya bajarê Rewanserê, ji aliyê hêzên hov ên henga sînorî ya rêjîmê ve bi tundî û dijwarî hatiye kutan ku li encam de birîndar bûye.
Pêka rapora "Kolber News"ê serê "Şehram" bi derbên qudaxa çekê bi dijwarî birîndar kirine û difina wî jî şikandine.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (469)